VAN | TSO

Odeya Pîşesazî û Bazirganîyê ya Wan'ê

# RAPORA BAJARÊ WAN' Ê A DANASÎN Û RAZEMENDİYÊ




**RÊYA WAN Û ŞAXÊ**

Li gel qedandina rêya Wan û Şirnexê a çêkirina wê berdewam dike a ji ser rêya perwarê û şaxê derbasî herêma besta dibe dê hatina Wanê hêsantir bike. Bi qedandina vê rêyê, rêya ku dirêjahiya wê 700 km ye dê bikeve 200 km ya. Ev rê windahiya dem a hemwelatiyên me ên ji Kurdistan û Iraqê têne bajarê me dê ji holê rake.

## AVHEWA Û GOLANÊ WANÊ



Rûpîvana Behra Wanê 3.713 km ye. Behra Wanê şor û bisodayî ye. Ji ber sedema rêje ya xwê ya ji % 19 ye di gel zivistanên dijwar û bilindahiya zedejî cardin naqerise. Asta bilindahiya avê 1646 m ye.Kûrahiya teqrêben 171 m ye,cihê herî kûr jî 451 mîtroye. Di herêma rojhılata Behra Wanê de çar girav hene. Evana; Extamar,Çarpanak,Adır û girava kûş in. Gola Wanê li peravên xwe yên fireh ve di sektora tûrîzmê de xwedî potansîyeleke giring e.

Li gel ku li Wanê avhewayiya bejahiyê tê dîtin jî ji ber bandora Gola Wanê mehên zivistanê bi awayek hêniktir derbas dibe. Di mehên de havînê teqrîbî germahî 28 C ye.

# SEWALVANÎ



Rûpîvana bajêr ji % 67mêrg û çêrgeha pêktê. Mêrg û çêrgehên bajarê me dengî % 10 ên mêrgê çêrgehên welatê me ne. Li bajarê Wanê zeviyên çandinîyê ji %48 tên avdan. Ev rewş çandinêyê di warê razemendiyê de giringtir dike. Zeviyên çandinêyê ên li bajarê me ji ber ku di rewşekî xwezayî û nedermankirîdene kêrhatî gihîştandina berhemên organîk in. Dema mirov rojên biroj ên bajarê me bîne ber çavê xwe bajarê me xwedî potansiyeleke guncan ya razemendiya ji bo fêkî û sebzeyên di bin serayan de.

Bajarê me ji bo xwedîkirina pêz û sewalên din di welatê me xwedî potansîyeleke mezin e. Bajarê me li gel xwedî 2,3 mîlyon pêz ve di welatê me de di rêza yekemîn de cih digre. Eger tesîsên goşt û entegreyê bên çêkirin bajar3e me dê pêdivîya goşt û tiştên ji goşt rêşeya herî mezin de bîne cih. Em di wê baweriyê de ne ku kesên razemendiya vê sektorê bikin dê demeke kurt de beranberî razemendiya bistîne.

# **TûRîZM**





Bajarê  Wanê li gel jêhatiyên xwe yên çandî,dîrokî û xwezayî ve xwedî mirovên germ û xwînşirîn in. Ji bilî vê xwedî taybetiyekî ku dikare mazûvaniya gelek cureyên werzişêyên xwezayî bike û xwedî potansiyela tûrîzmê a bêhempa ye. Bajarê Wanê bi şert û mercên avhewayî yên guncan ve ji bo mêvanên xwe ên ji Kurdıstanê û Iraqê dê bên re derfetên guncan ên rêwîtî û betlaneyê pêşkêş dike. Bajarê mey ê Wanê him bi taybetiyên xwe yên çandî û him jî yên dîrokî ve xwedî nirxên giring e. Behrama Wanê a ku ji wan hebûnan a girînge di warê tendurîstiy3e de jî xwedî nirxeke giring e.

Hejmara tûrîstên biyanî û xwecihî ên di salekê de tên bajarê me ji 600,000 zêdetir in.Bajarê me xwedî hejmarekî nêzî 7000 cihê razanê ye.

CUREYÊN TÛRÎZMÊ ÊN LÎ BAJÊR PÊŞKETÎ

*Tûrîzma çand û baweriyê
*Tûrîzma peravê
*Tûrîzma alternatîf
*Cureyên werzîşa zivistanê û tûrîzma çiya û xwezayê
*Tûrizma zozanan,tûrîzma eko û bejahiyê
*Tûrizma fûar û kongreyan
*Tûrîzma germav û tenduristiyê
*Tûrîzma keştiya seyranê û marîna

# RAZEMENDİYÊN ENERJİYÊN



Dema roj dîtinê ( nêzî 300/roj/sal), asta radyasyonê bilindahî û zeviyên dijî çandiniyê tên bikar anîn li ber çav bên derbas kirin dê bê dîtin ku bajar3e Wanê di hêla enerjiya rojê de dı Tirkîyê de bajarê herî bi avantaj e. Ji ber vê yekê bajar3e Wanê ji bo razemendiya enerjiya xwe nû dike fersendên pêşkêş dike û razemanda vedixwîne herêmê. Di vê çerçoveyê de ji aliyê fîrmayekî almanî ve xebatên fîzîbîlîteyê ên derhekê razemendiya enerjiya rojê tên kirin.

**ENERJİYA ROJÊ**

Tê texmîn kirin ku bi giştî potansiyela rojê a Wanê 14.000 MW ye. Ev hejmare beranberî ji 1/4 a hêza enerjiya heyî a tevahiya Tirkîyeyê ye.

**POTANSİYELA HİDRO ELEKTRÎKÊ**

*Herêm li gel xwedî enerjiya rojê di hêla enerjiya hîdroelektrîkê de jî xwedî potansiyeleke dewlemend e.

* Çem û rûbarên Wanê (wek Ava Mûradê, Çemê Şaxê, Çemê Miksê) ji razemendiyên hidroelektrîkên mezin guncan in.


* ji bilê van , taybetî jî di hêla projên HES ên mikro de gelek çavkaniyên biçûk ên avê ku bên nirxandên hene.

**POTANSİYELA ENERJİYA GERMAVÊ**

Li Wanê cihên germavê ên ji bo razemendiyê hene. Ev cihene kêrî tûrîzma tenduristiyê, germahiyê û serayan tên.

# PIŞTGIRÎYA DAKAYÊ

Ajansa pêşketina rojhılata anatolyayê (DAKA) piştgiriyê dide xebatên kargehan,kooperatîfan,yekitîyan kes û kesên hikmî ên armanca wan karkirîne û projeyên wan ên wekî li jêr hatî nîşandan destek dike.




## PIŞTGIRÎYÊN WEZARETA ABORÎYÊ

Ji ber ku bajarê me di herêma 6. de cih digire fîrmayên dê ku li bajarê me di çerçoveya nêrîtandina teşwîqê a ji hêla wezareta aboriyê ve hatiye weşandin de dikarin ji teşwîqên li jêr de cih digirin sûd wergirin.

| PERGALA TEŞWİQA NÛ | | | |
|---|---|---|---|
| Nerîtandina Teşwiqên Giştî | Nerîtandina Teşwiqên Herêmî | Teşwiqên Razemendiyê Pivekên Gewre | Teşwiqên Razemendiyê Stratejîk |
| - İstisnaya KDV' ê<br>-Mûafiyeta Baceya Gumrîkê | -İstisnaiya KDV' ê<br>-Muafiyeta Baceya Gumrikê<br>-êxistine Baceyî<br>-Piştgiriye Hisseyê Karsazê a prîmên Sigortê<br>-Sazkîrina Cihê Razemendiyê<br>- Piştgiriyê Faizê | -İstisnaiya KDV' ê<br>-Muafiyeta Baceya Gumrikê<br>-êxistine Baceyî<br>-Piştgiriyê Hisseyê Karsazê a prîmên Sigortê<br>-Sazkîrina Cihê Razemendiyê | -İstisnaiya KDV' ê<br>-Muafiyeta Baceya Gumrikê<br>-êxistine Baceyî<br>-Piştgiriye Hisseyê Karsazê a prîmên Sigortê<br>-Sazkîrina Cihê Razemendiyê<br>- Piştgiriyê Faizê<br>-Paşrêdaina KDV' ê |

